wek PDKI, Komele , PJAK û partiyên din wek saziyek baş û cêhê bawerî hatiye nasandin û hemiyan ji nûçe u raporên wê saziyê îstîfade dikin. Ew sazî ji aliya dewletê bi fermî nehatîye qebul kirin û dewlet bi temamî jî êrişê ser wî nake, ji ber ku mesele ya mafê mirovan li Îranê hinek hestyar û hesas e û pirsgirêkên nawnetewiya Îranê di wê warê de heye. Sazîyekî mafê mirovan armanca wî li welatekî bindest wek Kurdistan de gerek berî her tiştek 2 armanc hebe; 1. nûçegehaniyekî rast û deqîq . 2. perwerdekirina gel di warê nas kirina mafên xwe yên huquqî.

Hun dizanin ku di Kurdistanê de gelek caran û belkî rojane û dem bi dem bûyerên nexweş û zulim ji aliya dewletan pêk tê. Gelek ciwan û jinên kurd tên girtin an şehîd kirin. Mînakî ciwanê kurd li mehabadê " Şiwane seyd Qadir "bê ku tu gunehek kir be ji aliya hêzên dewletê hat qetil kirin. Me dît ku belav bûna wêneyên qetil kirina Şiwane li ROJ TV bû sebeb ku li hemî cîhanê de meseleyekî esasî ya bin pê kirina mafê mirovan li parçeyekî Kurdistan biteqe. Tenanet serhildanên mezin çê bûn. An jî gelek kes dikewin nawa zîndanan û gerek man girtina wan an jî zulmê ku li wan tê kirin , bikewe ber çawê cîhanê û gel jê agehdar bibin. Xweşewtandina jinan û herweha meseleyên wek hebûna mayîn (elxam) li ser sînoran û gelek babetên din hene ku saziyekî mafê mirovan dikare li ser wana bisekine. Saziya mafê mirovan gerek nûçegehanî bike û êşa gel biqêrîne û dengê xwe bigêjîne her derekê. Dema dujmin li me dixin, ew mafê me ye ku biqêrînin. Eger em usa nekin wê her roj zêdetir û bi cesaretek xorttir êriş dewam bikin.

Ya dûyemîn jî meseleya perwerde kirina gel. Em 30 xalên bingehîn a danezana mafê mirovana cîhanî didin gel heya ku wan bixwînin û bikarbin astek ji bo mesele ya mafê xwe nas bikin , heta ku dujmin bi rehetî êrişê wan neke û bikarbin li mafê xwe parastin bikin.

_ Sedema ku tu ji bo wê hatî girtin çi bû?.

* ez ne cara yekemîn e ku têm girtin û bawerim ku ew car jî ne cara dawî be. Ez gelek caran hatime girtin û bi gelek îşkenceyan jî rû bi rû mame. Mînakî sala 2000-2001 û sala 2004 bi taybetî min di wan salan de gelek zehmetî dîtin.di wan salan de ez bi tawana alîkarî û endametîya PKK hatim girtin û herweha gelek tawanên din jî didan ser min. min qet endametiya tu partiyek nepejirand. Min digot ku ez niwîskarekî serbixo me. Ez ji birêz Abdûllah OCELAN wek feylesufêk hez dikim û ew jî eger tawan be ez amademe ku cezaya wê tawanê bidim, lê ez ne girêdayê PKK me û hurmeta min ji bo gerîllayên wê partiyê û welatparêzên PKKyî jî heye. Ew bersiv dujimin dîn dikir. Min gelek caran bi hêzên ewlekarî diketim nawa munaqeşe û em li ser mesele ya Kurdistan , maf û herweha birêz Ocelan diaxifîn. Lê mexabin hêzên dewlet bi lêxistin û odeyên tarî û îşkenceyan bersiv didan.

Îcar tawana min dostanîya PJAK , alîkarîya endamekî RMMK bi nawê "Sirwe Kamkar " û got û bêj bi televîzyonên kurdî bi taybetî ROJ TV bû. ⟶